

Gelî malbatan,

Li Encûmena Xwandingeha Herêma Hamîlton-Wentworthê (HWDSB) ji bo em rewşa hînkariya destekkir, hembêzkir û birûmet pêşkêşî hemû xwandinkaran bikin em her bi biryar in astengîyan bixuyînin û rakin.

Ji bo em xwandinkarên xwe bêtir nas bikin, em ê pirsîneke bi dilxwazîyê û veşartî li dar bixin. Di Nîsana 2021-an de *Em Hemû tên Jimartin: Jimartina HWDSBê ya Xwandinkaran a 2021-an* ji bo astengîyên sistematîk bixuyîne û li ser wan rawestê dê li ser nasnameyên xwandinkaran (nîjad, regaz filan) pirsan bipirse.

Gelek encûmenên xwandingehan jimartina xwandinkaran li dar dixin. A rastî, ji Qanûnê Têkoşîna bi Nîjadperestîyê re ya 2017-an û Pîlana Bizava Wekhevîya Hînkariyê ya Ontaryoyê re divê encûmenên xwandingehan van daneyan berhev bikin û bidin zanîn. Di heman demê de ev di Pîlana Bizava Jêdera Xwebixwe ya HWDSBê de procekteke pêşik e.

Em dizanin ku pirsîna li ser nasnameya kesîn dibe ne di cîh de be, û em ê vê bi zîzî pêk bînin. Em bi xwandinkaran, malbatan, rênçberî û endamên civatê şewirîn û ka ev jimartina nifûsê çawa dikare alîkariyê bike ku wekhevîya HWDSBê, biserketina xwandinkaran û kêfxweşîya bi dayîna biryarên palpişt bi îsbatan çawa wan destek bike.

Ev ê çawa bibe?


Hînbûyîyên rû bi rû – Zarokxaneya ta Sinifa 4an: Dê her xwandinkar tevî vê nameyê nisxeyeke çapkirî ya vê formê jimartina nifûsê bibe male. Dê dêûbav li ser nave zarokên xwe formê jimartina nifûsê tije bikin û kaxezê formê jimartina nifûsê li xwandingehê vegeşînin. Eger li ser torê tijekirina forma jimartinê ji xwe re bibijêrin, dê karibin girêdanka ewle ya bê peyderkirin jî bi kar bînin. Ji kerema xwe serê her xwandinkarî bi tenê formetek jimartina nifûsê dagirin (li ser torê yan çapkirî).

Hînbûyîyên ji dûr ve – Zarokxaneya ta Sinifa 4an: Em ê girêdankeke veşartî ji malbatan re bi nameya elektronîk bişînin ta ew karibin formê jimartinê li ser tore yan li ba zarokê xwe temam bikin. Nisxeyên çapkirî li ser xwastinê li ba mamhostayê zarokî hene. Ji kerema xwe serê her xwandinkarî bi tenê formeke jimartinê tije bikin (li ser tore yan çapkirî).

Hînbûyîyên rû bi rû û yê ji dûr ve – Sinifa 5an ta 12an: Em ê ji xwandinkarên sinifên 5 ta 12an re bi bi nameyê elektronîk girêdankeke ewle bişînin, bi vî awayî dikarin bi desteka mamhostayî di dema sinifê de formê jimartinê li ser tore dikarin dagirin. Nisxeyên çapkirî dikarin ji mamhostayî bînin xwastin û peywdar kirin. Ji kerema xwe serê her xwandinkarî bi tenê formeteke jimartina nifûsê tije bikin (li ser torê yan çapkirî).

Ev li çi dipirse?

Li gora temenê xwandinkarî, pirsên jimartina nifûsê, dibin li ser zimanên xwandinkarî, nasnameya Herêmî, koka nîjadî, azbat, dîn, nasnameya cinsî, meyla cinsî, (ne)karînan, cîhê jidayikbûyîyê û welatîbûn/awayê koçberîyê bin.



Dê HWDSB zanyarîya kesîn a xwandinkaran çawa biparêze?

Gava HWDSB li ser xwandinkaran û malbatan zanyarîyê berhev dike, sozê veşarîbûn û bidizîbûna tenga herî bilind dide. Daneyên jimartina xwandinkaran, bi Qanûnê Têkoşîna bi Nîjadperestîyê yê 2017ê, S.O. 2017, c. 15, Qanûnê Hînkariyê, R.S.O. 1990, c. E.2 û Qanûnê Serbestîya Bidestxistina Zanyarîyê û Parastina Veşarîbûnê, R.S.O. 1990, c. M.56 re lihevhatî ye.

Jimartina xwandinkaran veşartî ye lê bi tevahî nine. Bersivên xwandinkarên serbixwe dê ji bo nirxandinê tevlihev bîn komkirin yanî zanyarîya tu xwandinkarê serbixwe nikare bê binavkirin. Dê bersivên berhevkiirî di zemîna zanyarîyan a veşartî, bi dizî de bîn parastin û dê bi tenê rênçerê HWDSBê yê Lêkolînê & Nirxandinê karibe xwe bigihîne ta ku karibe meylên di nava xwandinkarên HWDSBê de bixuyîne û kurt bike.

Ma ew mecbûrî ye?

Temamkirina jimartinê bi dilxwazîyê ye. Lê em dixwazin xwandinkar tevli bibê, em bi vî awayî dîtineke rast a nifûsa xwandinkarê xwe bi dest dixin. Tenga bilind a bersivan dê alî me bike em astengîyan bixuyînin, stratejîyan ava bikin û bêtir alî me dike em li ser astengîyên li ber biserketin û dilxweşîya xwandinkaran biryarên zanatir bidin. Malbatên ku naxwazin zarokên wan tevli bibinê dikarin formeteke li ser Portala Dêûbavan dagirin û dev jê berdin.

Çi pirs?

Gava em xwe ji bo jimartina nifûsê kar dikin em gazî dikin û bersiva pirsan didin. Ji kerema xwe bêtirî wê ji sîteya me ya înternetê fêr bibe; www.hwdsb.on.ca/weallcount, li ser jimartina nifûsê çî pirs bîn meraqkirin hûn ê Pirsên Gelekê Caran tînin Kirin (FAQs) karibin li vê derê bibînin. Hûn herweha dikarin bi komxebata me ya jimartina xwandinkaran re jî ji vê derê têkilî bikin; census@hwdsb.on.ca.

Mala we ava ji ber ku we bi berpîrsîyarî ji bo berhevkirina zanyarîyan alî HWDSBê kiriye ta ku em karibin di sîstema xwe ya hînkariyê de encamên adiltir pêk bînin.

Bi xêr û xweşî,

Manny Figueiredo
Birêvebirê Hînkariyê